



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî Xelek 31

3 - Babekê Xûramî kî ye?

Peyva *Babek* ne nave. Ev peyv bi lexem hatiye gotin. Yanê navekî tevgerî-şorşgerî ye. Navê *Babek* yê rastîn Hesen'e. Lê belê kok û binyata *Babek* ji kû ye? Gelo ew bi kok û eslê xwe Kurde, Erebe yan Farise?

Dîroknas û gotûbêjên wan:

Dîroknasên Misilmanan li ser kok û binyata *Babek* xwedî baweriyên cihê û cawazin. Derbarê kok û binyata *Babek* da sê gotûbêjên cuda hene:

Gotûbêja yekem: li gor vê gotûbêjê, rêbir û çeteyekî nenas hebûye ku jêra *Meter* gotine. Vî kesî gotiye ku ew alîgirê kesekî bû bi navê *Ibin El-Rewad*. Dibêje ku di rêwîtiyeka xwe da rast jinekê bi navê *Piromîd* hatiye (negotiye li kûderê, lê xuyaye ku li Azerbeycanê bû). Gotiye ku *Piromîd* jineka çavşaş û xizan bû, ji wî ra cil û bergên wî dişuştin. Bêyî mehirkirin, ew bi jinikê ra raketiye û demekê ji wê dûr maye. Gava ku vegeyriyaye, *Piromîd* jêra gotiye ku ew ji wî ducanî bûye û zarokê wê çêbûye; ji wî xwastiye ku ew wek bav xwedîtiyê li zarok bike. Lê belê wî gef li jinikê xwariye û gotiye heger tu vê sirê belav bikî ezê te bikujim. Piştî ku *Babek* mezin bûye û bi nav û deng bûye, *Meter* ev sira han ji kesekî ra bi navê *Elî bin Mur* gotiye. Gelek xuyaye ku ev gotûbêj li ba xwe afirandine⁽¹⁾.

Gotûbêja duwem: Li gor vê gotûbêjê *Babek* kurê kesekî boyaxvan (boyaxcî) ji bajarê Medayîn (li Iraqa niha) bûye ku jêra *Abdulah* digotin. Vî kesî amana boyaxê li piştî xwe dikir û li gundan digeriya heya gihîşt Azerbeycanê. Li wir, li gundê *Bilal-Abaz* ji jineka çavşaş hezkir (navê jinikê nehatiye gotin). Ew herdu bi tenha xwe çûn nav daristanê, bi stran, mûzîk û vexwarina meyê (şerabê) xerîk bûn. Piştî xelk bi wan hesiyan, mirovê boyaxvan destê jinika çavşaş ji bavê wê xwast û bi hev ra zewicîn. *Babek* ji vê dayîkê çêbû û boyaxvan jî di rewşeka ne diyar da li çiyayê *Sebelan* hate kuştin. Piştî wê demê, dayîka *Babek* bi parsê zarokê xwe

¹ El-Teberî. Tarîx El-Teberî, 9/54.

mezin kir, ji xelkê ra wek xizmetkar cil û berg dişuştin, daku zarokê xwe xwedî û mezin bike⁽²⁾.

Gotûbêja sêhem: Zanyarê Kurd, xwediyê zanîneka berfireh, *Ebo Henîfe El-Deynûrî* (ji bajarê *Deynûrê* yê rojhilatê Kurdistanê) nivîsandiye ku *Babek* kurê *Muteher* kurê *Fatîme* keça *Ebo Muslimê Xurasanî* ye; û gotiye ku hin alîgirên *Fatîmeyê* ji *Xûramiyan* hebûn ji wan ra "*Fatîmeyî*" digotin. Ev gotûbêj tê wê maneyê ku *Babek* yek ji neviyên *Ebo Muslimê Xurasanî* ye, wî li dijî *Dewleta Ebbasî* serî hildaye daku tola bapîrê xwe bistîne. Hêjayî gotinê ye ku *Ebo Henîfe* ew agahdariyên ku nav û dengê *Babek* xirab dikin nenivîsandine. Bajarê *Deynûr* di nav herêma şoreşê da bû. Helbet, ewê ji hemiyan bêhtir ji nûçeyên şoreşê agahdar be û kê di vê şoreşê da beşdarî kiribe⁽³⁾.

Gelo Babek bi kok û binyata xwe Kurde?

Di beşê *Ebo Muslimê Xurasanî (Behzad)* da, bi me ra derbas bû ku warê bingehîn yê malbata wî *Rustaq* (herêma *Ferîdîn (Ferîzîn)*) bû. Ew herêma kurdî ku dikeve navbera Esfehan û Xozistanê. Yan jî li rojavayê Esfehanê, yanê navbera Esfehan û Loristanê, warê Kurdên Lor (Lurr). Me berê jî gotibû ku *Rustaq Ferîzîn* di herêma Kurdên Lor da ye û malbata *Ebo Muslim* ji Kurdên Lore. Lor li beşê kurdî yê Îraqê bi navê *Feylî* û *Pehlî* tên naskirin. Ev vedigere ser gotina "Pehlewî, Pehlewani" ya kevin⁽⁴⁾ (li nexşeya Îranê binêrin).

Pir gengaz û mimkine ku *Meter* (bavê *Babek*) jî bi koka xwe Lor be û ji gelê *Ebo Muslimê Xurasanî* be. Mesela ku *Babek* li Azerbeycanê ji dayîk bûye û li wir mezin bûye, tîne bîra me ku *Bendad* bavê *Behzad (Ebo Muslimê Xurasanî)* bi malbata xwe ya biçûk va çûbû Azerbeycanê; ji ber karmendên dewletê bazdabû, ji ber ku nikarîbû kiraya zeviyên ku li herêma *Ferîzîn* ji dewletê biribûn bide, û di pey ra li Azerbeycanê wexer kiribû. Hêjayî gotinê ye ku Azerbeycan hên ji heyama *Madan* da warê Kurdan bû. Di pey ra *Turkuman* bi talana *Selcoqî* ra di sedsala 5-ê goçî (11 z.) ketin wê herêmê. *Selcoqîyan* dewleta *Rewadî* ya kurdî ji holê rakirin û wisa dewleta *Şedadî* jî li Erranê, ew herêma ku niha di navbera komarên Azerbeycan, Ermîniya û Gurcistan da hatiye parvekirin. *Selcoqîyan* li Azerbeycanê serdarî xistin destê *Turkumanan*. Serdariya *Turkumanî* li wir di dema *Sefewîyan* da her ku çû xurttir bû. Bi encama wê beşekî ne biçûk ji Kurdan bûn Turk⁽⁵⁾.

² Ibin Al Nedim, Al Fihrist, rûpel 416. Huseyn Qasim Al Ezîz, Al Babekiye, rûpel 271.

³ Ebo Hanifa El-Daynuri, Al Exbar Etiwal, rûpel 402.

⁴ Ibin Xellikan, Wefiyat Al A'hyan, 3 / 149. Ibin Xurdazbe, Al Mealik wel Memalik, rûpel 20 -

21. Ibin Hewql, Suret Al Erd, 22 / 365. Al Ya'hqobi, Al Buldan, rûpel 88.

⁵ Mihrdad R. Izady: Tht Kurds, P. 151, 180

3- Di ti jêderan da nehatiye piştrastkirin ku *Babek* bi kok û binyata xwe Faris be. Mesela ku wî bi zimanê farisî û erebî dizanî, ji ber têkiliya wî bi Erb û Farisan ra bûye.

4- Mijara ku *Babek* kurê *Muteher* kurê *Fatîmeyê* keça *Ebo Muslimê Xurasanî* ye, wek ku zaniyar *Ebo Henîfe* nivîsandiye û perwedeya wî li herêmên Azerbrycanê yên kurdî ku bajarê *Baz (Bedh)* ê kurdî ji xwe ra wek paytext biriye û ji ber rastiya baweriya wî ya *Xûramî* ku beşeke ji ayîna kurdî niştîmanî (*Ezdayî*), ev hemû belege ne ku bi tundî kok û binyata *Babek* ya Kurd piştrast dikin.

Niha tenha ma ku em bêjin, çawa *Babek* bû rêberê şoreşa *Xûramî*?